



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)

wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

**Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî**
**Xelek 11**

# Reşkirina Nav û Dengê Neteweya Kurd di Bermayên Îslamî da

Tu netewe li vê cîhanê nîne ku di her warekî da xwedî taybetmendiyên here bilind be û bê kem, kurtî û kêmasî be. Helbet, bi dirêjahiya demên dîrokî - bi taybetî jî di navbera neteweyên hawsê û cîran da - pir caran dijberî û berberî peyda bûne û peyda dibin. Ji lewra, ne dûrî aqilane ku her neteweyek li ser neteweyên cîran hin xalên reş - mafdar yan ne mafdar - li nav gelê xwe û gelên din belav bike û di berheman da jî qeyd bike. Lê belê tiştê bi fêş û gelek ecêb ewe ku em neteweyekê bibînin, ya ku ji aliyê cîranên xwe va, bi awayekî pilankirî û bi şêweyekî dûrî aqil û rastiyê, bibe armanca reşkirin, bedkirin, pejartin û raholkirina nav û dengê wê. Bi taybetî jî ev bobelat bi serê neteweya Kurd hatiye. Di hin jêderên bermaya îslamî da (jêderên ayînî, dîrokî, erdnîgarî, wêjeyî û helbestvanî) gelek nûçeyên cuda û têvel hene ku bi mebest nav û dengê neteweya Kurd rahol- û reşdikin. Ev rahol û reşkirin bêhtir di du waran da aşkera û diyare:

## Yekem: Raholkirina rah û binyata neteweya Kurd:

Hin nûçegihayên Ereb bi mebest hebûna gelekî bi navê *KURD* ku di dîrokê da xwedî rah, kok û binyat be înkar kirine. Hinekan ji wan rah û binyata Kurdan gihandine rahên Ereban, hinekan ew gihandine Farisan û beşekî sêhem ji wan Kurd gihandine hîm û binyateka ne naskirî; wisa kirine ku pêşiyên Kurdan ji hin komên sêwlek û sotarên li çol û çiyan peyda bûne. Wek ku dûrî aqilan be, neteweyek bi navê *Neteweya Kurd* di dîrokê da hebe; yan jî wek ku hebûna gelekî bi vî navî, xwedî nasnameyeka serbixwe, diyardeyeka awarte û ne gengaz be. Hinek ji van afrînerên nûçeyan, di nîgaş û xeyalên xwe da, hên bêhtir ketine nava fantaziyan û binyata Kurdan gihandine cinan; cinan bi cariye û xizmetkaran ra tolazî û zîna kirine û ji wan Kurd peyda bûne. Hin nimûne li ser van nûçeyan:

- Dîroknasên Ereb *Al Mes'ûdî* (sala 956-ê z. wexer kiriye) dibêje ku mirovan li ser kok û binyata Kurdan li hev nekirine. Hinekan ji wan gotiye ku Kurd beşek ji Erebên Bakur yên herêma Hicazê ne, ew di demeka pir kevnar da çûne herêmên çiyan, ji ber ku ji azadiyê

hezkirine, ji bo av, mêrg û çîmenan li wan herêman, li kêlek û tenîşta Ecem û Farisan bi cih û war bûne. Di pey ra zimanê xwe yî erebî jibîr kirine, zimanê wan bûye ecemî. Hin nûçegihayên din jî gotine ku Kurd hozekin ji Erebên Başûr (yên Yemenê)[1].

- Dîroknas *Al Mes'ûdî* çîrokek ragihandiye, kurtahiya wê dibêje ku du mar li ser milên padîşah *Zehak (Dehak)* peyda bûbûn. Ev herdu mar bi mejiyên du xortan dihatin xwedîkirin. Bi encama vê yekê gelek xort ji rûniştivanên welatê Faris hatin kuştin. Daku ev barê giran ji ser gel sivik bibe, wezîrê padîşah *Zehak* ferman da ku li cihê du xortan, tenha xortek û berxek bên serjêkirin, mejiyên herdiyan tevlihev bikin û bidin maran. Bi vî awayî xortek rizgar dibû û ew dişandin çiyayên dûr. Ew xortên ku gihîştin wan çiyan bûn hov, di pey ra pir bûn û bûn destpêka peydabûna gelê Kurd[2].

- *Al Mes'ûdî* çîrokeka sêhem jî ragihandiye; Kurtahiya wê dibêje ku Kurd ji tovê cinanin. Nîgaş û xeyala afrînerê vê çîrokê pir fireh bûye. Vê carê bi hostatî nûçeyên ayînî ji bo peydakirina vê çîrokê bikar anîne. Di Qur'anê da (سورة ص, ayet 30 - 38, û sûreyê Sebe'i, ayet 12 - 14) hatiye ku Xweda cin xistine bin xizmeta pêximberê Ibranî *Suleyman Bin Dawûd*. Şîrovekerên Qur'anê bi ser va zêde kirine, û gotine ku pêximber *Suleyman* cin şandine daku jêra cariyên zîba, rindik û bedew ji herêmên dûr bînin. Lê gava cin bi cariyan va vegeriyan, Xweda hêz û şiyana padîşahî ji *Suleyman* standibû. Cinan ev keys û fersend bikar anî, û bi cariyên tol û minafiq ra zîna kirin. Piştî ku Xweda careka din hêz û şiyana padîşahiyê da *Suleyman*, dît ku cariyan ji tovê cinan zarok anîne. Rabû ew cariyên ku ji tovê cinan zarok anîbûn awareyî çiya û geliyan kirin. Wan dayîkan zarokên xwe xwedî û perwerde kirin; di pey ra di nav hev da pir bûn û ji wan rah û binyata Kurdan destpêkir. Çîrokeka din heye ku dibêje, tenha ciniyekî bi navê *Cesed* tolazî û zîna bi cariyan ra kiriye[3].

- *Raẍibê Esbehanî*, wêjevanekî Faris bûye (sala 1108 z. wexer kiriye) dibêje ku xelîfe *Umer Bin Al Xettab* li ser navê pêximber *Muhemed* gotiye: Kurd tovek ji cinane. Gava pêximber *Suleyman* êriş biriye welatê Hindê, ji heyştê cariye bi xwe ra anîne û di giravekê da bi cih kirine. Ji nav ava deryayê cin derketine û bi cariyan ra tolazî û zîna kirine. Ji wan heyştê cariyan 40 ducanî û avis bûne. Gava xeber dane *Suleyman*, ferman daye ku cariyên ducanî ji giravê derbixin û bişînin welatê Faris. Gava ew 40 zarok ji dayîk bûne û di pey ra pir bûne, di welat da bûne diz, talanker û rêbir. Gelê herêmê li ba *Suleyman* gilî kiriye. Rabûye gotiye: Wan bikeridînin (bera wan bidin) û bişînin çiyan. Ji ber wê navê wan bûye Ekrad[4].

- *Kuleynî* mirovekî ji bajarê Bexdadê ye û ji mezinên zanayên ola Şî'e ye (sala 941 z. wexer kiriye) dibêje: *Aba Al Rebi' Al Şamî* ji *Îmamê Şeşemîn Cehfer Al Sadiq* pirsiye û gotiye: Li ba me hinek *Ekrad* hene,

tên nav me, em bi wan ra karê kirîn û firoştine dikin. Îmam rabûye gotiye: *Aba Rebî'*! Teve wan nebin! Ev tovek ji tovên cinane, Xweda perde ji ser wan rakiriye, hûn teve wan nebin! Di ragihandineka din da ya *Kuleynî* hatiye, ku *Cehfer Al Sadiq* gotiye: Kes li gel Ekradan nezewicin, ew ji tovê cinane, ne keçên wan bibin û ne keçên xwe bidin wan![(5)].

## Duwem: Reşkirina kesayetiya kurdî:

Ji bilî danîna gumanê ser rah û binyata kurdan, hin afrînerên nûçeyan di heyamên *Îslama Siyasî* da bi pisporî di raholkirin û bedkirina kesayetiya kurdî da beşdar bûne. Hin caran hin kem û kurtiyên çend kesan yan hin koman avêtine ser seranserê neteweya Kurd. Hin caran jî, hin kar, tewr û taybetmendiyên bi fêş û ecêb ku ne aqil û ne logîk dipejirîne avêtine ser Kurdan. Li jêr hin nimûne:

- *Al Tabarî* (sala 923 z. wexer kiriye), ew mirovekî Farise, ji herêma *Teberistanê* ye, dîroknas û şîrovekarê Qur'anê ye, agahdariyek معلومة li ser navê *Abdullah Bin Umer Bin Al Xettab* ragihandiye, ku ew kesê pend daye *Nemrûd* ku pêximber *Îbrahîm* di agir da bisotîne, mirovekî Kurd ji revendên welatê Faris bûye[(6)].
- *Abo Al Se'ûd Al Îmadî* (sala 1574 z. wexer kiriye), şîrovekarê Qur'anê ye û herhal bi xwe jî Kurde, ragihandiye ku dema *Nemrûd* biryara sotandina pêximber *Îbrahîm* daye, ferman daye ku komeka mezin ji dar û êzingan bidin ser hev. Gava agir berdane koma dar û êzingan, agir wisa gur bûye, kesekî nikarîbûye nêzî wî bibe daku *Îbrahîm* bavêje nava agir. Rabûye *Îblîs* hatiye û ew hînî duristkirina mencenîqê kirine ku pê *Îbrahîm* bavêjin nava agir. Di ragihandineka din da gotine ku yê mencenîq durist kiriye mirovekî Kurd bûye. Xweda li wî hatiye xezebê û ew avêtiye nava kûraniya dojehê[(7)].
- *Abdurrehman Al Seforî* (sala 1589 z. wexer kiriye), dîroknas û biwêjekî ji bajarê Mekkeh bû, li ser navê mirovekî bi navê *Al Qezwînî* ragihandiye ku *Îblîs* gotiye: Ez li ba Kurdan di hêminiyê da dijîm, ji ber ku ew herdem bi ya min dikin[(8)].
- *Ibin Esakir* (sala 1213 z. wexer kiriye), ew zanayekî ayînî û dîrokzanekî ji bajarê Şamê ye, ragihandiye ku mamostayekî zarokek hînî Qur'anê dikir. Gava zarok ayeta 6-ê ji sûreyê *Al Tehrîm* xwendiye: " { يَا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُوا قُوا أَنفُسَكُمْ وَأَهْلِيكُمْ نَارًا وَقُودُهَا النَّاسُ وَالْحِجَارَةُ عَلَيْهَا مَلَائِكَةٌ غِلَاظٌ شِدَادٌ لَا يَعْصُونَ اللَّهَ مَا أَمَرَهُمْ } ", mamosta gotiye: Evana ji sedî sed Kurdên herêma Şehrezorê ne, ev bi tu awayî ne feriştin[(9)].
- *Yaqot Al Hemewî* (sala 1229 z. wexer kiriye), ew zanayê erdnîgariyê ye û dîroknasekî bi eslê xwe *Romî* ye, ragihandiye: Kurdên herêma Şehrezorê rêyan dibirin û hebûnên xelkê didizin, û di pey ra dibêje:

„Ev demîn û taybetmendiyeka Kurdan ya naskirî ye, û sinciyeke ku li ser eniyên wan hatiye nivîsîn“; û bi ser va zêde dike ku hinekan bi qerf û henek ayeta Qur'anê bi awayê "Kurd di kufir û nîfaqê da yên here tûjin, "الأكراد أشدّ كفراً ونفاقاً" xwendine. Lê gava gotine ku ayeta Qur'anê ne wisa ye; ayet dibêje: "E'rab (Ereb) di kufir û nîfaqê da yên here tûjin, "الأعـراب أشـدّ كفـراً ونفاقـاً" (sûreyê *Al Tewbeh*, ayet 97), radibe dibêje: "*Xweda ezze we cel* neçûbû Şehrezorê ku wan hemû belayên di qunc û koşeyan da veşartî bibîne"[(10)].

Ev hin nimûne bûn ji van nûçe û ragihandinên bedbext ji bo reşkirin û raholkirina nav û dengê Kurdan di jêder û bermayên îslamî da. Ev jî gelek aşkera û diyare ku ev çîrok û ragihandin ji hemû rê û rêzikên dîrokî, ji bingehên aqil û rastiyê dûrin. Hîngê dimîne ku em bipirsin: Gelo sedema vê êrişa seferber li ser Kurdan çi ye? Û kî di pişt belavkirina van nûçeyên derewîn da bû?

## Jêder

[1] Al Mes'ûdî, Murûc Al Zeheb, 2 / 122 - 123.
[2] Jêdera jorîn.
[3] Jêdera jorîn.
[4] Al Raxib Al Asbihanî, Muhaderat Al Udeba'.
[5] Al Kuleynî: Al Kafî, 5/158, 352, jêdereka Elelktronî.
[6] Al Tabarî, Came' Al Beyan 10/43.
[7] Abi Al Se'ûd, Irşad Al Eqil Al Selîm, 6/76.
[8] Al Sefûrî, Nuzhet Al Mecalis we Muntexeb Al Nefais, rûpel 380
[9] Ibin Esakir, Dîroka Şamê, 73 /68.
[10] Yaqot Al Hemewî, Muhcem Al Buldan, 3/426 - 427.